

SERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com

Hejmar: 12

Dîrok: Nîsan 2024

Biha: 1000

DENGÊ ŞOREŞ û AZADIYÊ



BIJÎ 1Ê GULANÊ BIJÎ SOSYALÎZM



TEVGERA KOMÛNÎST A ŞOREŞGER

www.tevgerakomunist.com

komunistenrojawa

tevgerakomunist



Li çar parçeyên Kurdistanê û tevahîya Rojhilata Navîn li dijî zilm, dagirkerî, qirkirin, îxanet û teslîmîyetê berxwedan tê dîtin. Di 8ê Adarê de jinan dirûşmeyên azadîyê qîriyan. Newroz veguherî qadên ku li dijî Dehaqên îroîn agirê serhildanê lê tê pêxistin.

Gelê me; da zanîn ku têkoşîna wekhevî û azadîyê ya li dijî mêtîngerî, faşîzm û hevkarîyê wê ti carî neyê terikandin. Gelên qedîm ên Rojhilata Navîn ên Kurd, Erebi, Ermenî, Asûrî, Suryanî, Êzîdî, Fars, Tirk û Tirkmen, daxwaza xwe ya jîyana wekhev û azad bi xurtî nîşan dan. Kolan bi dirûşma “Jin, Jîyan, Azadî”, bi hêz û coşa jinên ku li dijî pergala kapîtalîst a serdest a mêr

serî hildane tijî bû.

Gelê me neçar e ku xwe bispêre hêza xwe. Çavkaniya xwehêzê rêxistinbûyîn e. Gelê bê rêxistin nikare li ber xwe bide. Divê hemû gelê me di serî de jin û mêrên ciwan bi rihekî seferberî ji bo parastina Kurdistanê tevbigerin. Têkoşîna li dijî tecrîdê divê di 1ê Gulanê de bi coş û îradeya 8ê Adarê û Newrozê bido-me. Divê li qadên 1ê Gulanê tifaqa tevahî ya zayend, netewe û çîna bîndest bê mezinkirin. Divê 1ê Gulanê li xakên şoreşê bi coş bê pîrozkirin. Dema ku qadên 1ê Gulanê bi coşa 8ê Adarê û Newrozê tijî bibin ev gel têk naçe!

2 ROJEV:

Ji bo Rojhilata Navîneke Azad Em Cepheya Gel a Antî Emperyalîst

4 JIN:

Jinan Ji Bo Jîyaneke Azad û Wekhev Qad Dagirtin

3 DÎROK:

“Ji Bo Rojekê Serhildan, Ne Hên Kêmtir”; Bijî 1ê Gulanê

6 CIWAN:

Ciwantî Derfet e Vê Derfetê Qezenç Bike

Li Dijî Şer û Dagirkerîyê; Yekîtî Têkoşîn Serkeftin!

Li çar parçeyê Kurdistanê û herêmê, li cihê ku Kurd lê dijîn agirên Newrozê hatin pêxistin. Careke din li dijî zilma zaliman, li dijî radestî, îxanet û Dehaqên îro gelên me rabûn ser pîyan. Newrozê Kurdistanê ku hatîye çar parçekirin Kurdistan kir yek. Li dijî êrîşên dagirkerîyê yên dewleta Tirk û hevkarên wê bû bersiv. Gelên me li dijî xeta îxanetê ya PDKê bi awayekî zelal xistin holê. Newroz; li dijî mêtîngerîyê, dagirkerî û hevkarîyê bû navê vîna netewî. Gelê me ji tevahî cihanê re îlan kir ku dê dev ji têkoşîna azadî û wekhevîyê bernade. Newroz, bû vegotina xwesteka jîyaneke azad a gelên Kurd, Ereb, Suryan, Asûrî, Êzîdî, Farsî, Tirk û Tirkmen.

Newroz, li dijî tecrîda ku 24 sal e li ser rêberê gelê Kurd Abdulah Ocelan tê ferzkirin bû serhildana milyonan. Ji berxwedana ku di zindanan de mezin dibe re bu deng. Gelê me yê ku weke aborî hatîye feqîrkirin, bi herikîna qadên Newrozê nîşan da ku qasî nan û av pêwîstî bi azadîyê dibînin. Newrozê nîşan da ku, têkoşîna azadîya jin ku di 8ê Adarê de hatîye xistin holê û têkoşîna rizgarîya netewî derbasî nav hev bûye. Di rihê Newrozê de coş û hêza jinên ku bi dirûşmeya "Jin Jîyan Azadî" li dijî pergala bavîksalar serî hildidin hebû.

Bi Coşa Newrozê Li Dijî Dagirkerîyê Têkoşîn

Rojhilata Navîn xwedî taybetmendîyeke ku parzemînên Asya, Ewropa û Efrîqayê bi hev re girê dide ye. Herêma me, di milê petrol û xaza ku ji bo zivîrîna çerxê kapîtalîzmê pêwîstî pê tê dîtin gelekî dewlemend e. Ev rehenda jeostratejîk, Rojhilata Navîn dizivîrîne qadeke ku tê de reqabet û têkoşîna hegemonî di navbera emperyalîstan de xurt dibe.

Di serî de Emerîka, Rûsya, Sîn û Elmanya, Fransa, Îngilistan, Tirkîye, Îran, Misir, Erebîstana Sûdî û Îsraîl tevgera xwe li ser Rojhilata Navîn kûrkirine. Rûsya, Sîn û Îran di mihwerekê de cih digirin, Emerîka û dewletên Rojavayê Ewropa di mihwera dij de cih digirin. Îsraîl di herêmê de wekî niçika Emerîka

û Îngilistanê cih girtîye. Misir di demên dawî de bi Îranê re tîkîliyên xwe zêde dike. Bandora aborî, sîyasî û leşgerî ya Îrana ku hewldana xurtkirina mihwera Şîî dide ya li Sûrî tê zanîn.

Xeleka Qels a Zincîrê Kurdistan!

Kurdistanê ku ji aliyê Îran, Iraq, Tirkîye û Sûrî ve hatîye çar parçekirin û hatîye dagirkirin, ji bo herêmê xetereyeke mezin e. "Aramî" ya ku mêtînger dixwazin ava bikin xirap dike! Her parçeyekî Kurdistanê, hebûna bingehîn a dewleta serdest tehdît dike. Hebûna tevgerên pêşeng û rêber ên ku azadîya Kurdistanê dixwazin ji bo wan encamên hilweşîner dihevin! Dewleta Tirk a ku parçeyî herî mezin e Bakurê Kurdistanê di bin mêtîngehîya xwe de digire, her destkeftineke Kurdan ji bo desthilatdarîya xwe weke pîrsgêreke mayîndetîyê dibîne. Ji ber wê di şerê li dijî Kurdan de erka serkana giştî ya leşgerî girtîye ser milên xwe. Bi vî awayî hem xeyalê girtina di bin mêtîngehîya xwe de ya Bakurê Kurdistanê, hem jî ger derfet bibîne berfirehkirina sînorên xwe ava dike.

Dewleta Iraqê, dest bi xebata binesazîya xeta bazirganîyê ya ku di bendera Fawê re derbas bibe kir. Projeya ku gihandina Ewropayê ya barên ku Asyaya Rojhilat û Kendava Basrayê bîndî rojevê de ye. Ji bo vê avakirina rêyeke 1200 kilometr ku di Bakurê Kurdistanê û Tirkîye re derbas bibe tê hedefgirtin. Ev proje, maydeya dewleta Tirk a ku di nav qeyraneke aborî de ye vedike. Dewleta Tirk û Iraq di aliyekî de ji bo hevkarîya aborî tîn cem hev, lê di aliyê din de dewleta Tirkîye bi şertê tesfîyekirina gerîlayê azadîyê yê Kurd bazarî dike. Pîlanê îlheq û dagirkerîyê yê li ser Başûrê Kurdistanê di dewreyê de ye. Dewleta Tirk, ji bo tesfîyekirina tevgera azadîya Kurd û destkeftinên wê di nav amadekarîyeke berfireh de ye. Başûrê Kurdistanê jî di nav de, tesfîyekirina avaniyên xweser demokratîk ên gelê Kurd di rojevê de ye.

Li Başûrê Kurdistanê qadên gerîla û Rêveberîyên Xweser ên Mexmûr, Şengal, Bakur û Rojhilatê Sûrî ji bo dewletên

herêmê yên mêtînger xetereyeke stratejîk pêk tîne. Ev qad li ber li gorî xwe dîzaynkirina wan dibin asteng. Malbata Berzanî û PDKê ya ku Başûrê Kurdistanê bi rê ve dibin piştgirî didin ev pîlanê tesfîyekirinê. Dewleta Tirk, ji bo planê tunekirin û tesfîye yê li ser Kurdan dixwaze ku dewletên Iraq û Îranê qanah bike. Tê dîtin ku Emerîka jî piştgirî dide vê operasyonê. YNKê ya ku di milê destkeftinên Kurd de helwesteke welatparêz nîşan dide tê tehdîtîkirin. Li dijî gerîla hevkarîya artêşa Iraqê û hêzên Pêşmerge tê pêşxistin.

Pêvajo Xeternak e!

Li ser Bakur û Rojhilatê Sûrî, êrîşên dewleta Tirk ên dagirker bînavber berdewam dikin. Tê xwestin ku di nav gel de bêhevîfî û bê bawertî biafirînin. Wekî êrîşên li ser Dêra Zorê tê xwestin ku tifaqa Kurd - Ereb bê belavkirin.

Hêzên Îran û Sûrî jî rastênhevê êrîşên dewleta Tirk êrîşên xwe zêde kirin. Hikumeta Şamê jî bi dorpeçkirina aborî ya Şehbayê hevkarî dide dagirkerîya dewleta Tirk a li Efrînê. Tê xwestin ku dagirîya Efrînê bê rawekirin. Dewleta Tirk sahaya hewayî ya Sûrî îxal dike. Hikumeta Şamê li dijî vê bi bîdeng mayîna piştgirî dide.

Em Li Ber Xwe Bidin û Bi serkevin!

Ger dewleta Tirk a mêtînger û faşîst, bikeve Rojava, Şengal an jî Qadên Parastina Medyayê wê derketina wê nebe.

Ligel ev cure êrîşên tesfîyekar û qirker gelê Kurd serî natewîne. Hêzên gerîla di bin şertên zehmet de be jî ji bo berxwedanê biryardar in. Dewleta Tirk dagirker derbên giran dixwe. Hêzên gerîla, li dijî balafirên keşfê yên dewleta Tirk, bi sîstema parastina hewayî ya nû gaveke stratejîk avêt. Rojava, bi hevpeymanî nû ya civakî careke din xist holê ku di bernameya xwe ya demokratîk, şoreşger û azadîxwezîya jin bi îsrar e.

Derveyî xwe spartina hêza xwe ya cewherî tu çaresarîya ya din a gelê me nîn e. Çavkanîya hêza cewherî rêxistinbûn e. Gelekî ne rêxistinîkirî nikare li ber xwe bide. Di serî de xort û jinên ciwan divê tevahî gelê me ji bo parastina Kurdistanê bi rihekî seferberî tev bigere.

Ji bo Jîyaneke Wekhev û Azad Em Bîherikin Qadên 1ê Gulanê

Divê bi coş û vîna ku di têkoşîna li dijî tecrîdê, di qadên 8ê Adarê û Newrozê de hatîye xistin holê amadekarî bê kirin. Divê tifaqa çîn, netew û zayenda bindest, di qadên 1ê Gulanê de bê xistin holê. Pêwîst e ku 1ê Gulanê li axên şoreşê layîqî navê xwe bê girtin dest. Divê kargeh û maleke ku nehatîye çûyîn nemîne. Dema ku 8ê Adarê, Newroz û 1ê Gulanê bi tevahî wurşeya xwe govenda azadîyê bigerînin dê ev gel tîk nece!



“Ji bo Rojekê Serhildan Ne Hên Kêmtir”; Bijî 1ê Gulanê

1ê Gulana ku roja Piştgirî, Têkoşin û Yekîtiyê ye, dîroka ku bi xwînê hatîye nivîsandin a karkerên ku ji bo sekinandina îstîsmariya kapîtalîst ketine tevgerê ye. 1ê Gulanê rojê berxwedanê ye. Bi têkoşînên mezin û bedêlên ku hatîye dayin hat bidestxistin. Karkerên ku li dijî istismariyê rabûn ser piyan bi hev re tevgerîyan, şalter (qata) daxistin û qadên têkoşînê dagirtin.

Dewletên Yekbûyî yên Emerîka (DYE), li ser xwîna gelên xwecihî hat avakirin. Çîna karkerên ku bêmilîk bûn piştî 1850an ji rojê 16 saetan bi mûçeyê gelekî kêmtir dihatin xebitandin. Karkerên bi awayekî hov dihatin istismarkirin, ji bona ku dema xebatê daxin 10 saetan derbasî ber guleyan bûn dabûn ber çavên xwe. Gelek bedel dan. Lê bi têkoşîna xwe hiştin ku çîna burjuva paş ve gav bavêje. Ev, ji bo karkeran destkeftineke gelekî girîng bû. Û vê serkeftinê, deriyê têkoşînê hîna mezintir û nû vekir.

Karkerên Awistralyayî, di sala 1856an de ji bo roja kar a 8 saetan biryara ji bo rojekê berdana kar dabûn. Û difikirîyan têkildarî cejneke karkeran daxwazên xwe bînin ser ziman. Bandora yekemîn pîrozbahîya ku di 21ê Nîsana 1856an de hatîye lidarxistin gelekî mezin bû. Biryara her sal dûbarekirina cejna karkeran hat dayîn. Agahîya ev çalakîya ku zanabûna hêza xwe ya hilberanê da çîna karkeran gihîşt welatên din jî.

Hedefa Karkeran Roja Kar a 8 Saetî

Di salên 1880an de, zagonên ku mafên karkeran ên bingeşin jî nas nedikir di meriyetê de bûn. Di aliyekî de şerîke bi awayekî lezan mezin dibûn, di aliyê din de şertên xebat û jîyanê her ku diçû giran dibûn.

Di 1881an de li Emerîkeyê sendîqeyên ku niv mîlyon karker temsîl dikirin, daxwaza roja kar a 8 saetî kirin. Têkoşin belavî seranserî welêt bû. Li bajarê Chicago (Şîkago) bi beşdarîya 40 hezar karker çalakî hat lidarxistin. Polîsan zora çalakîya karkeran bi xwînê bir. Gule hatin reşandin ser karkeran û 4 karker hatin qetilkirin. Di hin febrîqeyan de karker bi awayekî tomerî ji kar hatin derxistin. Karkeran, li dijî êrîşa polîsan paş ve gav navêtin. Agirê têkoşînê venemirîya, berevajî hîna gurtir bû. Di 1886an de, sendîqeyên karkeran en ku li Emerîka û Kanadayê bi daxwaza mafa xebatê, di roja 1ê Gulanê de grev îlankirin. Karkerên Şîkago (Chicaco), wê rojê weke bedemel bi xebitîna 8 saetan xwestin biryarên xwe pêk bînin. Bangewazîya çalakîyê, ji febrîqeyê belavî febrîqeyê bû, gihîşt hemû karkeran. Ala serhildanê pêl bi pêl bilind dibû. Kulmekî karkeran ku kes nikare asteng bike dihat şidandin. Hêrsê karkeran mezin dibû. Grev êdî tenê ji fikirbûnekê derketibû. Ew berxwedana mezin, êdî di rastiyê de pêk dihat û bi biryardarîya karkeran vediguhêrî hêzeke



madî (berçavî).

Karkeran, nedixwastin ku bibin koleyên bimûçe û tenê ji bo hilberandina kalêrê (sermîyan) bijîn. 1ê Gulanê rojê biryarê bû. Ji bo jiyaneke mirovane careke din gav dihat avêtin. Di febrîqeyan de dest bi amadekariyê hat kirin. Di belavoka 1ê Gulanê ya ku dest bi dest digerîya wiha dinivîsand: “Serhildaneke rojekê, Ne Hîna Kêmtir.”

Karkeran, rojê ku hêza sepandina zagonên kedê hatîye bidestxistin dixwastin. Wê şalter (qata) danîbana û hêza bêhempa ya ku artêşa karkeran afirandîye derxistibana holê. Rêberên karkeran, ji bo gavên hîna mezintir bangewazîya amadebûnê dikirin.

Roja 1ê Gulana 1886an, karkeran makîneyên kar dabûn sekinandin û febrîqe valakiribûn. Dîrok dibû şahidî hêza çîna karkeran. Hêza ku ji hilberanê dihat, di seranserî welêt de jîyan dabû sekinandin. Karkerên ku beşdarî girevê bûn gihîştin hev. Hejmara karkeran bi sed hezaran bû, karkerên ku dixwastin ji rojê 8 saet bixebitin çalakîyên xwe nesekinandin, sê rojan berdewam kir. Di febrîqeya McCormick de polîsan 4 karker qetilkirin, gelek karker birîndar bûn.

Roja din yanê 4ê Gulanê karker li qada Haymarketê kombûbûn. Karkerên ku hatibûn qetilkirin oxirkirin. Şîna hevalên xwe yê ku bi hev re têkoşiyabûn girtin. Karkeran, dizanibûn ku têkoşin bi bedêlan tê qezenckirin. Karkeran hevalên xwe yê têkoşînê bi dirûşmeyan oxirkirin.

“Hûn Nikarin Vî Agirî Vemirînin”

Serkaran, ji bo perçiqandina têkoşîna karkeran bi çeteyan ve li hev kiribûn. Polîs li bendê bûn ku êrîş bikin. Li nêzikî cihê

ku karkeran mîfîng çêdikirin bombeyek teqîya. Ev lêsorkirinek bû. Mirî û birîndar hebûn. Serkarên ku ji hêrsê karkeran ditirsîyan, rêberên karkeran sûcdarkirin. Bi sedemên ne rast rêberên karkeran Albert Parsons, August Spies, Adolph Fischer û George Engel hatin dîlgirtin û bi îdamê hatin cezakirin.

Di 11ê Mijdara 1887an de her çar rêberê karkeran bi rêya îdamê hatin qetilkirin. Ev gotinên rêberê karkeran Spies bû sembola têkoşîna 1ê Gulanê: “Ger ku hûn bawer dikin ku, hûn ê bi îdamkirina me tevgerê ku bi mîlyonan karkeran rêxistin dike tune bikin, nesekinin me îdam bikin. Hûn ê li vir çirûskê tune bikin, lê wê li her derê çirûskên din pê bikevin. Ev agirê ku ji hundir de pê dikeve ye, hûn nikarin vî agirî vemirînin.”

1 Gulan: Roja Piştgirî, Têkoşin û Yekîtiya Çîna Karkeran

Sendîqeyên karkeran, heta ku roj kar a 8 saetî hat qebûlkirin 1ê Gulanê roja girevê îlankirin. Di vê heyamê de di tevahî welatên ku têkoşîna karkeran pêş ket de biryarên hevşêwe hatin girtin.

Enternasyonala 2emîn ku di sala 1889an de kongreya xwe ya yekemîn kom kir, biryar girtin ku greva ku karkerên Emerîkî girtin, belavî tevahî welatên bikin. Di kongreya duyemîn ku di sala 1889an de hat li dar xistin de, 1ê Gulanê weke roja piştgirî, Têkoşin û Yekîtiya çîna karkeran hat îlankirin. Êdî, rojê ku karkeran daxwazên xwe qir dikirin û weke çinekê derdiketin qadan hebû. Karkeran di tevahî welatên de, daxwazên xwe ji febrîqeyan heta qadan kirin yek.

Dîroka 1ê Gulanê, wa ye wiha hat nivîsandin.

Jinan Di 8ê Adarê de Ji bo Jîyaneke Azad û Wekhev Qad Dagirtin

Di sala 1857an de li Emerîkayê jinên karker ên cawkarîyê ji bo “karê wekhev mûçeya wekhev”, ji bo şertên mirovî yên jîyan û xebatê çirûska têkoşînê pêxistin. Biryardarîya wan îro jî hîna hêz dide jinan. Îsal jî di 8ê Adarê roja cîhanî ya jinên kedkar de, jin di seranserî cîhanê de ji bo jîyaneke azad û wekhev li qadan bûn.

Li Bakur û Rojhilatê Sûrî berî rojan destpê kir xebatên 8ê Adarê. Panel, semîner, pêşengehên wêneyan, şahî û meş hatin lidarxistin. Jinan bi baweriya lidarxistina şoreşa jinê çalakîyên xwe rêxistinkirin. Li qadan reng, coş û kêfxweşîya jinan hebû.

Di axaftinan de têkoşînên bêhempa ya Arînan, Sarayan, Saryayan hat anîn ser ziman. Hat anîn ser ziman ku şoreşa jinê gihîştîye serkeftinê û destkeftinên mezin hatine bidestxistin. Û hat diyarkirin ku wê di şopa wan de destkeftin bîn parastin, wê dagirkerî û mêtîngerî bê têkbirin û wê tecrîda li ser rêberê gelê Kurd Abdulah Ocelan bê şkenandin. Jinan soz dan ku wê heta ku di tevahîya cîhanê de şoreşa jinê pêk bê têkoşîn bikin.

Di serî de li Reqa, Tebqa, Minbic û Dêra Zorê 8ê Adarê di pêşengîya Rêxistina Jin a Zenûbya de hat pîrozkirin. Jinên pişt a xwe dan şoreşa jinê, anîn ser ziman ku wê li dijî dewleta Tirk a faşîst ku dijminê şoreşa me ya jin e û şîrikê DAÎŞê ye wê bi têkoşîna yekbûyî ya jinan heta dawî li ber xwe bidin. Li dijî yên ku ji şoreşa jinê ditirsin, soz dan ku wê şoreşê bizivîrinin şoreşa jin a Rojhilata Navîn.

Bi hevpeymana ku berî demeke kin hat qebûlkirin, pergala hevserokatî û nûnertîya wekhev gihîşt misogeriya makazagonî. Di dema ku pîrozbahîyên 8ê Adarê yên ku berdewam dikir de mizgînî

hat dayin jinan ku wê hevpeymana jin a civakî bê amadekirin.

Jinên JKŞyî bi enerjîya komxebata ku di meha Çileyê de bi dirûşmeya “Şoreşa Jin ne Hêsan e Lê Serkeftin Teqez e” lidarxistin xebatên xwe yên 8ê Adarê meşandin. Di 20ê Sibatê de dest bi xebata xwe kirin. Belavok û rojnameya Raperîn belavkirin, serlêdana malan, civîn û perwerde çêkirin. Li Heseke, Kobanê û Qamişlo şahîyên bi coş lidarxistin. Di tevahî xebatan de kirin hedef ku hêza jinê ya rêxistinkirî mezin bikin. Di heman demê de li dijî amadekarîya şerekî mezin ê dewleta Tirk bangawazîya berxwedanê kirin û di şertên ku pîlanên qirkerîya li ser gelê Kurd de, rêxistinkirina şerê gel, parastina şoreşê û pêşengîya jinan nîqaş meşandin. Ji bo jîyaneke azad û wekhev, bal kişandin ser xistina şoreşê ya hundirê malan û erkên pêşxistina şoreşê ya ber bi sosyalîzmê ve. Roja 8ê Adarê jî di hemû qadan de, wêneyên Îvana Hoffmann û şehîdên jin, alên JKŞ û di stuyên xwe de bi laçikên sor di qadên çalakîyan de cihê xwe girtin.

Li Bakurê Kurdistan û Tirkiye Pîrozbahîyên Girseyî

Hema hema li tevahî bajarên Bakurê Kurdistanê jin daketin qadan. Jinên ku bayê hîlbijartinên 31ê Adarê jî dan pişt a xwe li qadan qirkirin ku wê bi tu awayî li dijî serdestîya mêr û mêtîngeran serî netewînin. Li dijî siyaseta şer a dewleta Tirk, li dijî êrîşên destdirêjîya li ser jin û zarokan soza têkoşîneke hîna xurtir dan. Tevahî bajarên Bakurê Kurdistanê bi rengê jinê xemilî. Dirûşmeya “Jin Jîyan Azadî” û zilxîten wan bi coş bû.

Di serî de li bajarên mezin li Tirkiye jî li dehan bajarên jinan qadên têkoşînê dagirtin. Jinan li dijî dewleta Tirk ku ev demeke dirêj destkeftinên jinên dikin

hedef, li dijî gavên kûrkirina tundîya mêr û koletîya malê, bi sekna xwe nîşan dan ku wê li dijî rejîma faşîst a AKP-MHP serî netewînin.

Qirkirin ku wê hesabê jinên ku her roj ji alî mêran ve tên qetilkirin bipirsin, ji tundîya mêr û dewletê re, ji tacîz û destdirêjîyê re gotin na. Jinên Rojavayî û Filistînî jî bîr nekirin. Qirkirin ku Erdoganê faşîst di gotinê de Filistînî ye, lê di rastîyê de şîrikê Îsrailê ye. Anîn ser ziman ku dewleta Tirk bi êrîşên xwe yên li ser Kurdistanê qasî Îsrailê kujerê jin, zarok û gelan e. Daxwaz, bêrî, êş û pîrsgêrêkên tevahî jinan anîn ser ziman.

Li Başûr û Rojhilata Kurdistanê jî jin li qadan bûn. Li Başûrê Kurdistanê êrîşên dagirkerîyê yên dewleta Tirk, qetlîamên jinê ku her diçe zêde dibin û întîharên jin rojevên bingehîn bûn. Bangewazî kirin ku ev êrîş bi hêza rêxistinkirî ya jinan bîn sekinandin. Li Rojhilata Kurdistanê jî jinên ku di 8ê Adarê de daketin qadan bi çalakîyên xwe nîşan dan ku agirê serhildana Jîna Emînî hîna venemirîyaye û bingeha serhildanên nû hîna xurt e.

Di gelek welatên cîhanê de jî jin di 8ê Adarê de daketin qadan. Ji Arjanfînê heta Elmanyayê, ji Lubnanê heta Kanadayê, ji Îngilistanê heta Îtalyayê, Ji Emerîkayê heta Swîsre di her bajar û welatê cîhanê de jin li dijî tundî, tacîz, destdirêjî, qedexeyên kurtajê derketin, daxwaza “Ji Karê Wekhev re Mûçeya Wekhev” bilindkirin. Li dijî pergala serdestîya mêr biryardarîyên xwe yên têkoşîna ji bo cîhanê nû anîn ser ziman. Li Fransaya ku bangewazîya greva jinê hat kirin, li 200 noxteyên cuda çalakî hatin rêxistinkirin. Di 8ê Adara ku îsal belavefî hat pîrozkirin de, bal hat kişandin ser dijbertîya koçberan û êrîşên faşîst ku zêde dibin û bal hat kişandin ser piştgirîya jinên Filistînî.

Em di pêvajoyeke ku di tevahî cîhanê de, pergala kapîtalîst a serdestîya mêr li dijî jinê şer îlan kiriye de, em di pêvajoyeke ku îstîsmarîya ked, beden, cinsîtiya jinê, komkujîyên jinê, tacîz, destdirêjî û tundîya li ser jinê zêde dibe derbas dibin. Lê, wekî ku di vê 8ê Adarê de jî hat dîtin, jinan jî nîşan dan ku wê li dijî tevahîya van êrîşan serî netewînin.

Dema ku em li geşedanên cîhanê dinêrin, şoreşa jinê û destkeftinên me gelekî hêja û girîng in. Em di serî de hevserokatî û nûnertîya hevbeş tevahî destkeftinên xwe biparêzin, ji bo hatin tetbîqkirina zagonên jin têbikoşin. Em li dijî mêtînger û dagirkeran şoreşa xwe ya jin di refên herî pêş de biparêzin. Em rêxistinên jinan mezin bikin. Em ji bo jîyaneke azad û wekhev têkoşîn û hevrêfî û piştgirîya jinê bilind bikin. Em bi hêza ku me ji qadên 8ê Adarê û Newrozê girtîye careke din li dijî dagirker, mêtînger û dijminên jinê di 1ê Gulana ku roja piştgirî, têkoşîn û yekîtiya çîna karkeran e biherikin qadan.



Ji Jinên Komunîst Pîrozbahîyên Bi Coş ên 8ê Adarê

Jinên Komunîst ên Şoreşger (JKŞ), berî 8ê Adarê li Kobanê û Hesekê civînên malan û xebatên perwerde pêkanîn. Jinên Rojavayî yên Komunîst, li Kobanê, Qamişlo û Hesekê pîrozbahîyên 8ê Adarê yên roja jinên kedkar a cihanî lidarxistin.

Di pîrozbahîya ku li **Kobanê** hat lidarxistin wiha hat gotin: “Em xwedî dîrokeke têkoşînê ya ku ji Clarayan, Rosayan, dirêjî ji Saryayan heta Berçeman dibe ne. Em ê bi vî mîrasî ji

bo serkeftina şoreşê bêsekn şerê xwe berdewam bikin”. Di pîrozbahîyê de şervana komunîst Îvana Hoffmanna ku di 7ê Adara 2015an de li Til Temirê di şerê li dijî DAÎŞê de şehîd ketîye jî hat bi bîr anîn.

Jinên Rojavayî yên komunîst li **Qamişlo** jî pîrozbahîya 8ê Adarê lidar xist. Di axaftina ku di pîrozbahîyê de hat kirin de wiha hat gotin, “Em jinên ku li Rojava serkeftinên mezin bi dest xistin e, lê hîna berpîrsîyartîya me ya

xistina hundirê malan a şoreşê heye.”

Jinên komunîst ku li **Hesekê** hatin gel hev 8ê Adarê pîrozkirin. Jinan gotin “Divê em baş fêm bikin ku azadîya me li ku derê ye. Divê em pêwîstîya yekîtiyê fêm bikin. Divê em bi hemû hêz û vîna xwe hev du biparêzin.” Di pîrozbahîyê de stran hatin gotin, govend hat gerandin. Jinên JKŞyî gotin “Şoreşa jinê ne hêsan e, lê serkeftin teqez e. Em ê weke jin ji bo parastina şoreşê li qadan bin.”



Komunîstên Rojavayî: Bijî Newroz bijî sosyalîzm

Komunîstên Rojavayî, berî 21ê Adarê pîrozbahîyên Newrozê yên bi coş pêkanîn. Tevgera Komunîst a Şoreşger (TKŞ) û Jinên Komunîst ên Şoreşger (JKŞ) li Kobanê, Hesekê, Qamişlo û Dirbêsîyê bi agirên ku pêxistin Newroz pîrozkirin.



Komunîstan, roja 20ê Adarê li taxên **Hesekê** bi pêxistina agirê Newrozê Newroz pîrozkirin. Endamên CKŞ, li ber navenda çandê ya şehîd Metîn Dîcle pîrozbahî lidarxistin. Ciwanên ku govend girtin, firework teqandin. Koma govendê ya Firat Newal lîstokên xwe pêşkeş kir. Endamê CKŞ Gîvera Serhed Newroza gelên ku li dijî dagirkerîyê li ber xwe



Welatparêzên Sosyalîst li **Kobanê** sê pîrozbahîyên Newrozê pêkanîn. Endamên TKŞê roja 21ê Adarê li ber sazîyê bi pêxistina agir Newroz pîrozkirin, karwana seyareyan pêkanîn.

Endamên JKŞê 21ê Adarê li taxên Botan Şarqê Newroza jinan pîrozkirin. Di pîrozbahîya ku bi dirûşmeya “Bi Agirê Şoreşa Jinê Bijî Newroz Bijî Sosyalîzm” hat lidarxistin de agirê Newrozê hat pêxistin. Bi sedan jinan li derdora agirê Newrozê govend girtin. Li derdora agirê Newrozê dirûşmeyên “Bijî Newroz Bijî Sosyalîzm” hat avêtin. Endamên CKŞê jî li kolanên Kobanê pîrozbahîyên Newrozê pêkanîn.

didin pîroz kir û got “Li dijî dagirkerîyê wê teqez serkeftin a me be. Heman şevê endamên TKŞê li ber bîneyeta TKŞê agir pêxistin û Newroz pîrozkirin. Li derdora agirê ku ji aliyê jinan ve hatîye pêxistin demeke dirêj govend hat girtin. Berdevka JKŞê Fadya Sîdo axivî û wiha got “Newroza 2024an ji bindestan re, karker û jinên kedkar re pîroz be. Em ji bo wekhevî û azadîyê bibin yek deng, şer bikin. Em li dijî dijminên faşîst bisekinin. Bijî Newroz, Bijî Sosyalîzm.”



Endamên TKŞê û CKŞê li taxa Xerbî ya **Qamişlo** agirê Newrozê pêxistin û pîrozbahî lidarxistin. Bi stranên ku hatin gotin Newroz hat pîrozkirin û lafîteya “Bijî Newroz Bijî Sosyalîzm” hat vekirin.

Welatparêzên Sosyalîst, li **Dirbêsîyê** di navenda bajêr de agirê Newrozê pêxistin û bi govendan Newroz pîrozkirin.

Ciwantî Derfet e Vê Derfetê Qezenç Bike

Herêma me ya ku weke Rojhilata Navîn tê nasîn li ser çanda eşîretvanîyê şêwe digire. Her wiha herkes di bin eşîretekê de bi cih dibe. Lewra ev pergala bi kevneşopîyên xwe, li ser ciwan û jinên ciwan tê ferzkirin. Tê xwestin ku mirov hîna di temenê zarokî û ciwantî de fêrî fikra ku eşîret bingeha civak û azadîyê ye. Ji ber vê jî ciwan û jin bi çandê tîr perwerdekirin. Li Rojava ya ku tê de gelek netewên wekî Kurd, Ereb, Ermen, Suryan, Çerkez, Turkmen, Asûrî û Keldanî û hwd. tê de dijîn ev çand gelekî belave ye. Ev çanda eşîretvanîyê bi taybetî di nav gelên Kurd û Ereb de belave ye. Hîna bi piranî hemû tîkîliyên civakî û hwd. li ser vê çandê tê meşandin.

Her dem her tişt li ser milê ciwanan dihat destpêkirin. Ji ber ku nifşên nû qebîliyeta wan bi girtina her tiştî re heye. Di heman demê de ciwan bi hêz û dînamîka xwe dikarin her tiştî bidin avakirin. Lê mixabin ev çand vîn û rastîya ku ciwan û jin bibin şexsên azad û serbixwe ku karibin li ser jîyana xwe de bibin xwedî biryar tune dike. Ciwan her ku dikevin bin bandora eşîretvanîyê, ev yek ketina xefîka bandora feraseta kapîtalîzmê xurt dike. Ji ber vê mijara me ya îro, ew e ku gelo di bin bandora vê çandê de ciwan rastî çî pirsgirêkan tîr?

Yekane piştî ku şoreş hate lidarxistin, van noxteyan gelek astengî derxistin. Bi piranî ciwan xwe xwedîyê vê şoreşê nabînin û berê xwe didin dewletên cuda ku li wir xewna xwe ya Ewropayê pêk bînin. Lê divê hemû ciwan bizanibin ku ji aliyê dewletên kapîtalîst û faşîst ve armanca vekirina derîyên koçberîyê dîrxistina me ya ji şoreşê ye. Di heman demê de bi vê armancê dixwazin ku axên şoreşê vala bikin û demografîya erdnigarîya me biguherînin û ciwanên me li welatên derve ji bo mezînbûna berjewendiyên wan fêrî jîyana kapîtalîst bibin. Ciwanên me yên ku ji ber sedemên aborî berê xwe didin welatên Ewropa yên kapîtalîst di nav çerxê pergala kapîtalîst de weke hêza erzan a kar tîr bikaranîn û keda wan bi awayekî tê îstîsmarkirin. Divê hemû ciwanên karker û kedkar bizanibin ku keda wan tê xwarin. Ji ber ku hîna kapîtalîzm bingeha xwe li ser îstîsmariya kedê ava dike. Keda hemû ciwan û zarokên ku di temenên biçûk de di febrîqe, pîşesazî û beşên din ên de kar de dixebitin bi awayekî hov tê îstîsmarkirin. Divê em fikra kapîtalîzm û armanca wê baş nas bikin, li dewsa ku em berê xwe bidin wan deran em bi mezinkirina şoreşa xwe li dijî vê rastîyê tîbikoşin.

Li welatên derve hemû karker û kedkarên ku ji bo debara xwe bi saetên dirêj dixebitin rastî her cure îstîsmariya tîr. Ciwan jî, ji ev îstîsmariya kedê ya kapîtalîzmê para herî giran digirin. Ciwanên Rojava yên ku koçberî dewletên kapîtalîst ên derve dibin jî dibin parçeyekî

vê mekanîzmayê. Dewletên kapîtalîst û emperyalîst dixwazin ku bi mezinkirina îstîsmariya kedê di tevahîya cihanê de desthiladariya xwe mezintir bikin. Alîyekî vê sîyasetê şerê taybet e. Ji ber ku dewletên emperyalîst çanda xwe bi her awayî di mîjîya ciwanan ava dike. Ji bo vê, rê û rêbazên cuda bi kar tînin. Amûrên wekî medyaya civakî, înternêta an jî belavkirina çanda mûsikaya dîrî çanda me, derxistina film û rêzefilmên ku êdî jîyanê de çanda jîyana kapîtalîst xurt dike an jî belavkirina çanda cil û bergan ku jê re tê gotin moda. Ev di şexsê mirov de psîkolojîyê ku xwe pêşketî hîs dike dide avakirin. Armanca wan ew e ku ciwan pêşketin an jî azadîyê di cil û berg, guhdarkirina mûsîka û hwd. de bibînin. Bi vê rêyê ciwan hêdî hêdî ji çanda xwe, rastîya xwe, hebûna xwe dîr dikeve. Hemû armanca jîyanê dibe armanca aborî û heta tîkîliyên hevaltîyê li gorî vê esasê tîr avakirin. Ev yek di navbera ciwanên herêmê de ferq û cudatî, hesasiyet û nakokîyan çêdike. Li gelek welatên herêmê tê dîtin ku ciwanên ku nikarin bigêhêjin wê astê intihar dikin.

Ya duyemîn belavkirina bikaranîna madeyên hişbir her tim di rêya ciwanan re tê pêk anîn. Ev sîyaseteke bi zanebûn e. Du armancên belavkirina vê çandê hene. A yekemîn bi rêya madeyên hişbir dejenerekirina ciwan û civakê û dîrxistina jî fikrên şoreşgerî û zanîstî. Armanca duyemîn jî bi rêya belavkirin û bazirganîya madeyên hişbir bi rêjeyên gelekî mezin pere qezenç dikin. Yanê bi kevîrekî li du çivîkan dixin. Hem, me û pêşeroja me hêdî hêdî dikujin û mîjîyên me ditewîzin, hem jî li ser kuştina me bi mîlyon dolaran pere qezenç dikin. Divê em li hemberî vê şîyar bibin. Bi taybet dewleta Tirk a faşîst dixwaze ku ciwanên me bi vê rêyê bixwe xefîkê û bike sixûr.

Ji bo ciwanan mijara herî girîng ku gelek jî bêkarî ye. Beşek jê dibin xwendewan. Lê dîsa rewşa aborîyê jî pirsgerêka herî mezin e. Pergalên desthiladêr di mîjîyan de daye fêrkirin ku ji zimanê dayikê dîr bikevin û spasnameya rêjîmê bigirin. Ji ber vê yekê piranî jî bo ku bigêhêjin vê astê mecbûr dimînin ku bi pereyên gelekî zêde perwerdeyên taybet bibînin. Ji ber vê yekê ciwanên ku aborîya wan lawaz e,



nikarin bixwînin û di heman demê de qadên kar jî gelekî lawaz in. Xurtbûna çanda eşîrtîyê tevlibûna ciwanan, bi taybetî tevlibûna jinên ciwan a saziyên şoreşê asteng dike. Derîyên saziyên şoreşê ji gel, ciwan û jinên ciwan re vekirîye.

Lê ji bo ku hîna bi temamî xwe xwedî vê şoreşê nabînin, piranî dibêjin “ger em di saziyên şoreşê de cih bigirin wê rojekê rejîm vegere û ji me hesap bipirse, wê demê em nikarin li vir bijîn û wê me bikujin.” Divê bê zanîn ku ev jî rêbazeke şerê taybet ku di mîjîya gel de tê çandin e. Lê di aliyekî de jî ev pirsgerêkeke bîrdozîyî ye. Dixwazin ku vê tîrsê gel û bi taybetî ciwanan ji refên şoreşê dîr bixin. Tê xwestin ku bawerî û xwedî lê derketina şoreşê tune bibe.

Lê dema ku em berê xwe didin Ewropayê, em di rêyên koçberîyê de rastî her cure nîzkatîyên dermîrovî tîr û ji birçîbûn, tîbûn, sermahî û di behran de difetîsîn û jîyana xwe ji dest didin. Ji ber gelek cureyên tundî, tacîz, destdirêjî, nîjadperestî rûmeta wan di bin lingan de tê pelixandin. Zor li jinên koçber tê kirin ku bedena xwe bifiroşin û bedena wan di bin pergala serdestîya mîr a kapîtalîst de dibe meta.

Ciwan û jinên hêja, êdî li hember van lîstokan şîyar bibin û bêrûmetîyê qebûl nekin. Ev şoreş zarokên xwe dixwaze. Xwe di dilê vê şoreşê de ava bikin, pêşeroj em in. Ji bo pêşeroja xwe em piştgirî bidin hev û rihê xwe bikin yek. Werin, em bi hev re li dijî sîyaseta dagirkerî, qirkerî û faşîzmê hişmendîya xwe biguherin û pêşeroja xwe bi destê xwe ava bikin. Ciwan şîtlên azadîyê ne.

“Baran Serhed Li Axên Rojava Fikra Azadî û Sosyālîzmê Çand”



Rêberê xeta Welatparêziya Sosyālîst û fermanarê sor Baran Serhed, di salvegera 5emîn a nemiriya xwe de bi bîranînên ku li bajarên Bakur û Rojhilatê Sûrî hatin lidarxistin hat bi bîr anîn.

Komunîstên Rojavayî li Heskê, Kobanê, Qamişlo û Dirbêsîyê bîranîn lidar xistin. Di bîranînên ku bi rêzgirtinê destpêkirin de, sînevîzyona li ser jiyana Baran Serhed hat temaşekirin.

“Em Di Şopa Hevrê Baran de ne”

Di bîranîna ku li **Kobanê** hatîye lidarxistin de li ser navê TKŞê Xanim Îbrahîm axivî û got “Em weke TKŞ û JKŞ di şopa hevrê Baran de ne”. Di axaftina din a ku di bîranînê de hatîye kirin de daxuyanîya “MLKP şitilgeheke Baran Serhedane” ku piştî şehadeta Baran Serhed wî hatîye kirin hat bi bîr xistin. Di axaftinê de wiha hat gotin: “Ji ber ku hemû hevrê û dostên me di perwerdeya Baran Serhed re derbasbûn. Hevrê Baran li Rojava, fikra azadî û sosyālîzmê çand. Ev fikir wê heta dawî zîl bide.” Di bîranînê de, axaftina Yilmaz Behrêşê ku di 12ê Hezîrana 2023an de li Kobanê şehîd kefiye sala par di bîranîna Baran Serhed de kirîye hat temaşekirin. Di bîranînê de koma mûsîka ya şagirtên Yilmaz Behrêş stran gotin.

“Erka Bilindkirina Ala Wî Li Ser Milên me ye”

Li **Qamişlo** bîranîna Baran Serhed li bîneya TKŞê hat lidarxistin. Nûnerên Sazîya Malbata Şehîdan, Partîya Yekîtiya Suryanan, Partîya Yekîtiya Demokratîk ê Kurdên Sûrî, Tevgera Çepê Şoreşger a Sûrî, Partîya Nûjen û Partîya Îradeya

Gelan jî tevî bîranînê bûn.

Ji nûnerên TKŞê Abdulhalîm Osman axivî û da xuyakirin ku Baran Serhed kedeke gelekî mezin daye damezrandina TKŞ û ala azadîyê dewrî wan kirîye. Osman di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “êdî bilindkirina ala wî li ser milên me ye”. Di axaftina ku li ser navê Sazîya Malbata Şehîdan hatîye kirin de bal hat kişand ser keda ku Baran Serhed ji bo şoreşa Rojava daye.

Ji bo ku Em Hevrêyên Baran Serhed in Serê me Bilind e”

Li **Heskê** jî alîyê TKŞê û CKŞê ve du bîranîn hatin lidarxistin. Di bîranîna ku li bîneya TKŞê hatîye lidarxistin de Cemîl Sîdwo axivî. Sîdwo di axaftina xwe de dîyar kir ku Baran Serhed ji bo azadîya gelên bindest, di xeta komûnîzmê de têkoşîna leşgerî û polîtîk têkoşîyaye. Sîdwo di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Hevrêno, komunîzm rêya rizgarbûna ji serdestan e. Em weke TKŞê, ji bo azadîya çîna xwe û bindestan têdikoşin.” Di bîranînê de berdefka CKŞ Destan Serhed jî wiha axivî: “Baran Serhed kedeke mezin da şoreşa Rojava. Di avakirina tûgaya Elîşêr Denîz û perwerdekirina bi hezaran şervanan de keda wî hebû. Ji bo ku em hevrê, şagirt û şervanên Baran Serhed in serê me bilind e.”

“Em Şagirtên Fermanar Baran Serhed in”

Endamên CKŞê li Heskê merasîma vekirina bexçeyê Baran Serhed lidarxistin. Di bîranînê de berdevka CKŞê

Destan Serhed axivî û got “Me hevrêyê xwe li şehîdlîga Serê Kanîyê oxir kir. Serê Kanîyê hat dagirkirin. Em ê îro vê bexçeyê bikin şehîtlîk, em soz didin ku em ê vê bexçeyê biparêzin, şîn bikin.” Li ser navê jinên ciwan ên komunîst Ekin Îsyân mafa axaftinê girt û wiha axivî: “Dema ku hevrê Baran got pêwîst e ku em şoreşê bixin hundirê malan, yekemîn behsa rêxistinbûna jinan û jinên û ciwan dikir. Ji ber vê yekê divê em îro şoreşê bixin hundirê malan.” Piştî axaftinan ciwanan stran gotin vekirina bexçeyê pêkanîn.

“Bi Hezaran Baran Mezin Dibin”

Di bîranîna ku li **Dirbêsîyê** hatîye lidarxistin Cemîl Sîdwoyê ku li ser navê TKŞê axivî dîyar kir ku komunîst ji destpêkê de tevî şoreşê bûn, di tevahî bajarê de şehîd dan. Sîdwo di berdewamiya axaftina xwe de got: “Li ku derê bindestek hebe em ê li wir bin. Wê li dijî kapitalîzm û emperyalîzmê têkoşîna me berdewam bike. Em ê heta dawîya dilopa xwîna xwe Rojava biparêzin”.

Di bîranînê de li ser navê malbatê Xalid Porê yê ku wesîqeya şehadetê girtibû jî mafa axaftinê girt û wiha axivî, “Em weke malbata wî, em dîyar dikin ku wê xwîna hevrê Baran li erdê nemîne. Me navê Baran da zarokên xwe, em ê bibin şopdarên wî.”

Endamê CKŞê Gîvera Serhed jî di axaftina xwe de anî ser ziman ku Baran Serhed kedeke gelekî mezin daye ciwanan û axaftina xwe wiha bi dawî kir “Em ê jî pêşerojê biafirînin. Wê têkoşîna me sosyālîzmê biafirîne.”

TKŞ: Yekane Rêya Têkberina Şovenîzmê Têkoşîna Gel a Yekbûyî ye

Komunîstên Rojavayî, bi boneya 20emîn salvegera komkuji û serhildana Qamişlo li ber stada 12ê Adarê daxuyanîyê çapemenîyê da. Daxuyanî bi zimanê Kurdî û Erebi hat xwendin. Di daxuyanîyê de êrîşa ku roja 12ê Adara 2024an di kêliya lîstoka fûtbolê de derketîye hat bi bîr xistin. Di daxuyanîyê de hat gotin ku “dema ku gelê Qamişlo û bajarên din ên Rojavayê Kurdistanê li dijî êrîşê li ber xwe dida, li bajarên mezin ên Sûrî jî Kurdan serhildan dan destpêkirin.”

Endamên TKŞê di dawîya daxuyanîyê de ev bangewazî ji gelên Sûrî re kirin: “nayên lîstoka rejîma mêtînger a Sûrî û dewleta Tirk a dağirker. Pêwîst e ku, gelên me yên Rojava xwedî li şehîdên 12ê Adarê û şoreşa Rojava derkevin. Pêwîst e ku şoreş bê pêşxistin. Yekane rêya têkberina şovenîzmê şoreş û têkoşîna gel a yekbûyî ye.”



Ji Dîroka Kurdistanê Rêberê Nemir: Qazî Mihemed



Di dîrka Kurdan ya berxwedêr de gelek rêberên nemir pêşengî ji gelê Kurd re kirine. Yek ji van rêberan ku bi fedakarî û bi dilsoza gotina xwe jî Qazî Mihemed bû. Mihemed, di 1ê Gulana 1893an de li Mahabadê, di nav malbata Qadî de hatiye dinê. Perwerda xwe ya bingehîn ji medreseya li Mahabadê û babê xwe Qazî Elî distîne. Piştî mirina babê wî ya di sala 1930an de ew ji bo Qazîtiya Mahabadê tê hilbijartin.

Qazî di nav gel de bi fedakarîya xwe û ji gel hezkirina xwe dihat nasîn. Rêxmê ku ji malbatek dewlemend û navdar jî bû, bi êşa gel ê xizan û belengaz dihesiya û alîkariya wan dikir. Ji xwe di qazîtiyê de jî bi dadwerîya xwe dihat nasîn.

Herwiha Qazî pir girîngî dida perwerdehiya xwe (û ya gel), timî xwe perwerde dikir. Gor hin çavkanîyan şeş ziman dizanî û kê zêde rojmaneyên welatên dîtir dişopand. Van taybetmendîyan dihêşt ku gel ji Qazî hez bike. Lê dîsa jî heta ku di sala 1941an de Artêşa Sor derbasî Rjhilatê Kurdistanê û Ezerbeycana Başûr ne bû, Qazî ne xwedî nasnameyekî siyasî bû.

Di şert û mercên ku şerê parvekirina emperyalîst ango şerê cîhanê yê duyemîn de, Artêşa Sor ji bo parastina YKSS (Yekîtiya Komarên Sovyet ên Sosyalîst) derbasî axa dewleta Îranê dibû ku, şahê Îranê alîkariya Hitlerê Faşîst dikir. Di van şert û mercan de di nav gelî Kurd de carek din derfetê avakirina dewletekê Kurdî derdiket holê. Li ser vê esasê di sala 1943an (gor hin çavkanîyan 1941an) de ji aliyê rewşenbîrên Kurd ve “Komelayî Jîyaneweyî Kurd” tê avakirin.

Malbatên mezin ên Kurdan, rewşenbîrên Kurdan di vê rêxistinê de bi awayekî veşartî xwe rêxistin dikin. Ev rêxistin

bi YKSSê ra tekiliyên xwe ava dike. Şandeyên Kurd diçin YKSSê. Ji ber ku gel jî Qazî hez dike û cewhera rêbertiyê di Qazî de tê dîtin, rêxistin banga beşdarbûnê li Qazî dike. Qazî dibe endam û rêberê rêxistinê.

Di navbera wî û YKSSê de jî têkiliyên xurt hene. Bi pêşniyara YKSSê, Partiya Demokrat a Kurdistanê, di sala 1945an de bi serokîtiya Qazî Mihemed tê avakirin. Komelayî Jîyaneweyî Kurd, rêxistinekî welatparêz ê Kurd bû lê veşartî xwe rêxistin dikir, ji bo gelê Kurd hewcehî bi partî hebû. Lê rewşa gel ne gor partiyek Komunîst bû, jiber vê yekê li Ezerbeycanê partiya Komunîst, li Kurdistanê partiya Demokrat hatibû pêşniyarkirin. Ji ber ku têkiliyên civakî yên Kurdan hîn li ser esasê hilberînek feodal û eşîr-malbatî bûn. Her çî qasî Qazî girîngî dabe perwerdehiya gel jî di rewşa heyî ya şenber de, Partî li ser têkiliyên malbatî dihat mezinkirin.

Her wiha vê bandor li avakirina Komara Mahabad a Kurd jî dikir. Ji aliyê ve zarokên Kurdan ji bo perwerdê diçûn YKSSê, ji aliyê din ve wezaret li ser esasê hêza malbatî dihatin par vekirin. Lê daxwaza Qazî rizgarî û serxwebûna Kurdistanê bû û dema di 22ê Çileya 1946an de Komara Mahabadê dihat îlan kirin jî soz dida gelê xwe ku heta dawî wê gel û welatê xwe biparêze.

Komara Mahabadê ya Kurd ku li qada Çarçira, bi serokomarîya Qazî hatibû îlankirin, di emrê xwe yê kurt de encamên dîrokî derxist holê. Di warê avakirina sazîyên xwe de, di warê rêxistin kirina jinan de û di warê ragihandinê de gavên girîng avêt. Kurdî wek zimanê fêrmî hat bikar anîn. Alaya Kurdistanê hat diyarkirin û li ser hemû sazîyên dewleta Kurdî hat bilind kirin.

Sîrûda “Ey Reqîb” wek sîrûda ermî hat pejirandin. YKSSê hem di warê leşkerî de hem jî di warên civakî de alîkariyên şênber dan Komara Mahabadê ya Kurd. Lê YKSSê, bi dexta dewletên emperyalî û armanca “Îrenekî Demokratîk û yegirtî”, Artêşa Sor ji nav sînorên Îranê kişand.

Piştî ku êrîşa dewleta Îranê li ser Mahabadê dest pê kir, Qazî dilsoziya xwe bi gelê xwe û soza ku dayî re pêk anî. Rêxmê ku dizanî wê di sêdarên Îranê de bê îdam kirin jî, ji bo ku pêşî li komkujîya gel bigre li Mahabadê ma. Ji ber newekheviya hêzên leşkerî û tinebûna yekîtiyekê xurt di nav Kurdan de, bijarteka berxwedanê ne da pêş xwe. Lê Qazî teslîmê Îranê jî nebû. Di dadgehên Îranê de, dagirkerîya Îranê darizand. Xwedî li ala û yekîtiya Kurdan derket.

Beriya ku ji aliyê dewleta Îranê ve bê şehîd xistin di wasiyeta xwe da digot “Ez êdî demên talî yê emrê xwe dijîm. Ji bo xudê êdî ji hev re dijminahîyê nekin, bi piştgirîya hev li hemberê zaliman û dijminan bisekinin. Xwe bi erzanî nefiroşin dijmin. Dijminên gelê Kurd pirin zoryar û bê rehmin. Sembola serketina her gelekî yekîtiya wê, hevgerîna wê û piştgirîya wê ye. Her gelî ku yekîtiya xwe pêk neanî û îtifaqa xwe çênekir, wê bi dexta dijmin re rû bi rû bimîne, bindest be.”

